Saziye navdewletî yên tşkildar, wekî çawa di dema êrişê de ker û lal bûn, niha jî di heman rewşê de ne, lê dema mesele bû çirana Efrînê, ango Idlib, her kes rabû û xwe li erdê xîst û got nabe li Idlibê tu operasyon pêk were, ji ber ku sivil li wir hene! Tevî ku di raştîyê de ew dixwazin li wir berjewendiyên xwe biparêzin; ne xelk û ne jî mulkê xelkê.

Gotineke me kurdan heye dibêje: "Qey filankesê keça jinbavê ye!" Bi wateya ku cudahî di navbera wê

û yeke din de heye, ev gotin jî li ser meseleya Idlib û Efrînê derbasdar e. Ji ber ku diyar e ew qas zarok, kal, pîr û ciwanên Efrînê ku xwîna wan bi deştê arêşa tirk hat rijandin, li ber çavên wan ne xuya ye û nabînin.

Ew qas deverên dirokî yên hatin xerabkirin, li ser wan aciz nabûn.

Ew qas darên ku tîn rakirin û şewitandin, ew jî li cem wan ne girîng e.

Ji aliyê navxweyî ve jî hindek bûyer dihelîn ku em heman pîrsê bipirsin: "Ma Efrîn keça jinbavê ye?" Ji ber ku dema hejmarek ji malbatên efrînî û bi zorê xwe gihand herêman din ên Rojavayê Kurdistanê, raştî keysbazîya hindek kesan hatin û bi taybet jî ew bûyer gelek caran li herêma Cizîrê dubare bû; wekî nimûne, xaniyê ku kirêya wî jî 10 heta 15 hezar L.S bû, jî bo wan malbatan bi derdora 50 hezarî dihat dayîn. Tevî ku em dizanin Rojavayê Kurdistanê bi xelkê xwe ve her dem jî bo şoreşên kurdan helîn bû û palpiştê perçeyên din ên Kurdistanê bû.

Lê tiştê pêwîst e ku em wê jî zanibin, ew kesên keysbaz temsila çand û hemû xelkê ve deverê nakin, lê dişa jî pêwîstî bi gotin û rexnekirina wan heye.



**Hoseng Hesên**

Li kêleka wê, di van demên dawî de gelek meş û çalakî bi slogana "Yan Efrîn, Yan Efrîn" hatin pêkanîn û bi hezaran kes tevî bûn. Gotina her yekî jî wan jî ew bû ku ji rizgarkirina Efrînê pê ve, tu bijarte tune ye, ev jî rihê gelê Rojava ye.

Di dawiyê de jî dixwazim keda wan şervanên ku niha li Efrînê çalakîyan li dar dixin bi bir bixim; tevî ku bi hezaran çete û bi sedhezaran sîxur û ajanên wan hene, şervan li wir in û li dijî wan dagirkeran çalakîyên xwe pêk tînin.

Her ku civaka navdewletî û hindek kesên me dihelîn Efrîn wekî ya jinbavê xuya bike, şervan û qehemanên wê û dişa jî bi hezaran kes dibêjin rizgarkirina Efrînê soza me ye û jî bo wê sozê têdikoşin.

**Kurdino Hişyar Bin**

Miletê kurd jî diroka hebûna xwe ve miletekî aştxwaz e, eger şer neyete ber deriyê wî, ew jî şer hez nake, bi giştî dipeyivim, ji ber piraniya milletê me wisa ye. Hin jî ji me bi xwe hene, şer di xwîna wan de ye! Bila em xwe nexapînin, deştê dijmin di nava me de sitûr û req û dirêj e, her çende em çavên xwe ji raştîyê bigirin, em nikarin veşêrin.

Şoreşên me jî heta kêlîka nivîsina ewan tîpan, yek jî bi ser neketiye, hemû jî yan bi deştên me xwe bi xwe, yan jî bi deştên dijminan, an bi deştên dewletên mezin ên xwedan berjewendiyên stratejî û tektîkî li herêmê, tşk çûne.

Hin jî me têdigihiştin û bi tşk çûna xwe mikur tîn û hin jî hene mîna zirelokan serê xwe dikin nava axê û paşîya wan li der e, jixwe her dem xwe serkeftî dibînin, jî sloganên bi qasî çiyayan dadikevin sloganên herî piçûk û her dibêjin: Em serkeftî ne.

Jixwe dema ku mirov li hin kenalên kurdî temaşe û guhdar dike, mirov jî nûçeyên wan vedirîşe û li gora zirt û fort û pesnên wan, mirov jî xwe re dibêje ew Kurdistan bi xwe ne. Yên ku nizanibin, dê bibêjin wan deh Kurdistan çêkirine.

Di baweriya min de, jî ezmûnên gelek ên ku milletê me tê re bihûriye, zimanê çekan êdî nema sûtê dide, eger serdemên berê bûya rola çekan

pir girîng bû. Lê mirov îro têdigihişt ku milletê me -yê ku "dijminê serê xwe" ye- jî hemû aliyan ve şikeştî ye. Dijminên me jî xurt in, eger em çend leşkeran ji wan dikujin ew bi dehan gundên me wêran dikin. Ev ne ji tirsekê wisa dinivîsim û ne jî dilsariyê ye, na berovajî; ya girîng em karibin eniya hundirîn bihêz bikin.

Bila em di siyasatê de jî neyaran bihêztir bin, em lingên wan bişemîtin; ne ku ew me tîxin dehfikên xwe û bi wê nezaniya me, planên ku dixwazin bi cih bin... Kurd mîrxas in û dikarin beraberiya tang û firoke û topan bikin, lê li hember evê yekê, mixabin, di siyasatê de tşk çûyî ne. Kurd û siyasatê pir dûrî hev in. Em hêj bi wî mejiyê xwe yê berî hezar salî beraberiya teknolojîya hemdem dikin.

Bi giştî, ez dibînim danûstandina herî girîng: Ya kurd û kurd e, di pey re ya bi dijmin re ye, lê nabe em dijminekî ji yê din baştir bibînin, mafir ku ew dijmin in. Wek nimûne; partiyek danûstandina bi rêjîma Sûriyeyê re rewşa bibîne, lê ya bi rêjîmê Îran, Iraq û Tirkîyê re tawankarî bibîne! Yan partiyekê din danûstandina bi rêjîma Sûriyeyê re ne rewşa bibîne û ya bi rêjîmê din re rewşa bibîne.

Mijara danûstandinê girîng e, eger bo kurdewariyê û bo berjewendiyên her du aliyan be. Bila em jî xwe piçûk



**Ezîz Xemcivîn**

nebinin, liberxwedana sedên salan ne bê encam bû, tev li ku me ew deştkeftiyên dirokî bi deşt nexistîne, lê milletê me nav û dengê kêşeya xwe li cihanê belav kiriye. Rewşa me aloz e û em ne yek deşt û ne yek dil in, dilê me ne li ser birayê me ye û ne dilê birayê me li ser me ye.

Kurdino... Partîno!

Rewşa milletê me pir aloz e, nakokiyên xwe bi xwe piştguh bikin, bila em serê xwe ji hev re biçemînin, çêtir e jî serçemandina li hember dijminên me. Eger me li hev kir û em deng û dil û helwestek bin, ewê hingê em ê li hember neyaran xwe jî danûstandinên bihêz bikin.

Danûstandin qezenckirina mafan e, eger ne wisa be, dibe ku bê wate û bê sûtê be, lê bi giştî jî şer û xwînrijandinê çêtir e.

**Idlib: Gorîstana Navendî ya Rikberiya Sûrî**

Ji niha û heya demeke baş nêzik -dibe ku salek û du sal jî di wê navê re derbas bibin- dê gelek tişt zelal bibin û jî şopînerên aloziya Sûriyeyê re jî baş bêne xuyakirin û tşkîhiştin.

Idlib, ne ji niha de wek gorîstana çekdarên bi ser rikberiya Sûrî ve hatiye deştînanakirin, na, ev yek jî berê de ye, lê di vê dema borî de tenê ew didan ser hev û ew bêhtir dixistin di pirrika şerê terorîzmê û şerê navxweyî de.

Lê çawa deştê pê kir? Tirkîyeyê bû serleşker, rêveber û aligira sereke, ne tenê ew, lê hindek welatên eraban jî li teniştê raweşîyan.

Tirkîyeyê bang li gelek komên çekdar ên bi ser rikberiya Sûrî ve kir û jî wan re buhar anî çongê, got: "Werin em ê komareke we ya sinî li vir ava bikin û pê de herin, da ku em şerê hemû dijminên şoreşê bikin; çawa hemû aliyan ku bi me re ne hevalbend bûn û di serî de kurd."

Vê dawiyê Efrîn jî bû devereke baş ku komikên çekdar tê de bîn ser hev û bi kêra kurdî bibin beranê li ber serjêkirinê. Ji ber ku anî di qada Sûrî de, tu alî ji komikên çekdar ên rikberiyê ne razî ye, hemî jî dixwazin -îro berî sibe- ji wan xelas bibin û berê wan bidin mirîna reş, dojecha şerê bînavber. Di serî de kurd, Rûsiya, Şam, Tirkîye, Îran û hema kî jî DAIŞê bîzar bû, jî van komikan jî her wisa, tevahiya Ewropayê û her pêşî Fransa,

dixwazin ev komik tune bibin.

Gorîstana Idlib a navendî dê ji çareserîya aloziya Sûrî re gava pêşîn be, çawa ku dengê heye ku dê hin ji Şamê bilind bibe û Federalîya Bakurê Sûriyeyê/Sûriyeyê nênavendî bipejirîne û kurdan bi kirasekî bajarvanî, niştîmanperwer û şerkerên terora nêvdewletî ya islamî ji cihanê re pêşkêş bike. Lê ne tenê Şam, dê ji Şamê deştê pêk be û ev yek berdewam û dirêj bike, heta ku ne tenê Rojavayê Kurdistanê, lê belê bakurê Sûriyeyê bi ser parêzgehên Herêma Kurdistanê ve bibe, li jêr nakevî xweş "Kurdistan". Kurdistan ne welatê kurdan tenê ye; yê ereb, asûr, suryan û turkmenan e jî û niha amadekarî jî ve gava mezin û gelekî lipêş re tîn kirin.

Lê pîrsa herî sereke ya ku dimîne, ev e: Gelo çima mirîna van komikan deştê pêka çareserîya biraştî ye, çima wan jî nakin hevparê prosesa çareserîyê û her tişt bi awayekî aram û aştiyane nabe, çima dijminatîya li hember wan wiha gurr û har e, çima dawîya dawî her tişt dê di serê wan de biteq? Ji ber ku ereb in! Na, wa ye ereb li deverên din jî hene, çima kes bela xwe nafişê wan û bange-waziya qirkirina wan a li ser asta laşî nake! Naxwe ji ber ku misilmanên tundrew in û tenê dixwazin mîrateya islamê bi hemû rengên wê vejînin û siyaseta "Xelîfeyên Pêşîn", şerî'eta Pêxember ya Medîneyê vegeerînin! Erê û na, ji ber ku şerê li dijî islama



**Alan Pîrê**

siyasî û terorîzma islamî jî mêt ve deştê pê bûye û heta niha jî berdewam e.

Baş e, naxwe ji ber çî? Ji ber ku sinorên berê tîn rakirin û hinên nû tîne danîn, berê Sûriyeyê li parçêkirinê ye. Bazar bi van komikên çekdar re nabe, kesekî qebûl nakin, ne elewî, ne kurd, ne xirîştîyan, ne jî êzdî... dixwazin Sûriye ji deşt û berîka wan re be, ji ber ku gelekî bi Tirkîyeyê ve girêdayî ne, di ser ku ew girêdan jî kurdên Rojava re baş e, ji ber ku Tirkîye jî bi van komikan re ketiyê û va ye li Idlib û Efrînê komikên çekdar ew kişîşandîye serêşîyê gelekî mezin ku ji niha û çar salên din jî, ji krîza siyasî û aborî ya hundirîn xelas nabe.

Ji ber ku (û ev ya herî girîng e) Amerika bi carekê re û ne di xewnê şevan de, nahêle ku welatekî sinî li ser sinor çêbibe.

Ji hinan re, berê deverê jî aliyekî ve li xêrê ye û jî aliyekî din ve jî li çareseriyê ye; jî aliyê din ve, berê hinan jî li dojecha dawî ye. Dawî tal e, lê wateyê dide her tiştî, ji ber ku çî tiştê ku bi dawî nabe, yan nebe, wate jê re tune, wate jê re namîne.

**Bextê Rûs û Farisan Tune ye**

Heftiya bihurî li ser navê çeteyên li Sûriyeyê, Erdogan bi Serokê Rûsiyayê Vladimir Putîn û bi Serokkomarê Îranê Hesên Rûhanî re civiya. Di encama vê civînê de, li ser hinek xalan li hev kirin: 1. Operasyona leşkerî ya ku ji hêla rêjîma Sûrî ve dê li hember çeteyên li Idlibê deştê pê bikira, hat raweştandin.

2. Herêmeke bi qasî 15-20 km, di navbera hêzên rejîmê û çeteyan de, hetanî 15'ê cotmehê dê wekî "herêma tampon" jî hêzên çekdar paqijîkirî, were avakirin.

**Lîstika Erdogan, Rûhanî û Putîn!**

Wisa tê fêmkirin ku Erdogan, Rûhanî û Putîn li ser tşkîbirina deştkeftiyên kurdan li hev kiriye. Lewra çeteyên li Idlibê kom kirine, jî bo ku wan wekî fişarekê li ser kurdan di deştên xwe de bihelîn û li hemberî rejîmê deştên kurdan lawaz bikin. Gava duyemîn a vê lihevkirina di vê lîstîkê de jî ew e ku eger di 15'ê cotmehê de pêvajoya ku dane deştêpêkirin bi ser bikeve û eger jî deştên wan were, dê herêma aram-tampon berfreh bikin û kurdan dorpêç bikin.

Em baş dizanin ku piştî referandoma Herêma Kurdistanê, Erdogan hêzên Heşda Şabî û hêzên Iraqê şandin ser axa Herêma Kurdistanê. Piştî dagir-

kirina Efrînê, niha jî Erdogan dixwaze bi deştên çeteyên wekî El-Nusra, DAIŞ û komên din, zextên xwe li ser rêveberî û deştkeftiyên Rojavayê Kurdistanê zêde bike. Çavên Erdogan lê ye ku tevahiya deştkeftiyên kurdan -çî li Bakur, çî li Başûr û çî jî li Rojava- tşk bibe û li ser tevahiya sinorên Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê xetêke tampon ava bike, piştê jî tevahiya xaka Rojavayê Kurdistanê dagir bike, yan jî bi fêlbazî radeştî rejîma Sûrî bike.

**Kurd çî tevdîrê digirin?**

Li hemberî çavsooriya Erdogan, kurd çî dikin? Baş tê zanin ku li qada şer, hêzên kurdî bi canfedahiyeke mezin, şerekî bêhempa dimeşînin û dirok dinivîse. Her çî qas piştî 58 rojan Efrîn hatibe dagirkirin jî, raya giştî ya kurdî û aliyan navdewletî baş dizanin ku berxwedaneke çawa li hemberî tank, top û balafirên şer ên dewleta tirk û çeteyên wê hat dayîn.

**Dîplomasiya kurdî di kîjan astê de ye?**

Di dema berxwedana Kobanê de, hem li hundir hem li derveyî welat, kurdan hem di şer de li ber xwe da hem jî meriv dikare bibêje ku cara yekemîn bû di vê serdema em tê de ne kurdan ew qas baş diplomasiyê meşand û encam



**Xakî Bîngol**

jî jê girt. Lê belê demeke dirêj e di warê dîplomasiyê de kurd bédeng in. Hem li welat hem jî li derveyî welat, dîplomasiyeke berbiçav xuya nake. Piştî şerekî ku bi salan li Rojava û li tevahiya Sûriyeyê hate meşandin, niha jî hêzên serdeşt dixwazin Rojava û Sûriyeyê jî nû ve dizayn bikin. Gelo Rêveberîya Xweser a Rojavayê Kurdistanê, jî bona deştkeftiyên kurdan û ên gelên li Rojava çî tevdîrê girtine yan jî digirin?

**Çapemeniya Kurd**

Pirseke din jî divê em ji xwe û çapemeniya xwe bikin: Gelo çapemeniya kurdî çî qasî karê xwe dike; yan çapemenî jî bi dayîna şerê çekdarî û tenê bi nûçeyên li qada şer xwe dixapîne? Divê di warê dîplomasiyê de û di çapemeniyê de, em kurd şîyar bin û li her qadê em Erdogan û çeteyên wî teşîr bikin û bala raya giştî ya navdewletî û dostên xwe bikişînin ser vê çavsooriya Erdogan û hevalbendên wî.

**Nivîsên ku tîn weşandin, nerînên xudanên xwe ne.**



## Zimannas Bahoz Baran: “Axaftina kurdan ji nivîsara wan wêrektor, serbesttir, xweştir û rewantir e.”

Yek ji zimannasên kurdîyê yê sedsala 21<sup>ê</sup> ye ku hem bi helwesteke nûxwazî, hem jî bi armanca paraştina reh û koka hêmanan, di qada zimên de dixebite. Zimannas Bahoz Baran, sala 1982'yê li Lica Amedê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li Licê qedandiye, paşê li Zanîngeha Dîcle, beşa perwerdehiyê kuta kiriyê. Herî dawî, sala 2015'an tevî Zanîngeha Mardîn Artukluyê bû û tê de beşa kurdî xwend, heta ku lîsansa bilind qedand.

Aniha editorê Weşanxaneyê Wardozê û xebatkarê Weqfa Mezopotamyayê ye.

Berhemên wî:

- Rêzimana Kurmancî, Zimannasî, Li gel Mikail Bilbil, Weşanên Enstituya Kurdî ya Amedê, 2008
- A Baş, Çîrok, Weşanên Belkî, 2010
- Rêzimana Kurmancî, Zimannasî, Weşanên Belkî, 2012
- Derb, Çîrok, Weşanên Avestayê, 2014
- Ferhenga Bîşaftînê, Ziman, Weşanên Wardozê, 2017
- Motik, Meselok\Folklor, Weşanên Wardozê, 2018
- Rêzimana Kurmancî, Zimannasî, Weşanên Wardozê, 2018

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtan

**- Rojnameya Bûyerpressê sipasdarê cenabê te ye ji bo evê hevpeyvînê.**

Ji bo vê derfetê, ez malavayîya we dikim.

**Serê pêşîn, ez ê çar salan bi şûn de ve gerim û keysa xwe ji evê derfetê bînim. Dema ku mirov bi çavê kirîna li “Derb”a te dinîhêre, nizane ka çawa bide polandin û di kîjan refê de bi cih bike; wêrekî û cesareta vegotîna tê de berz e, her çî qas bi honkaziyeke nûjen (modern) hatiye lêkirin, lê rengê zargotîna û folklorê tê de serdest e!**

Di warê çîroknûsiya modern da, hîn gelek qonax ji me ra divên. Lê divê mirov derba ewil li qaliban bixe. Qalibên pûç û vala ên li ser nivîsina çîrokan. Min ji wê derbê dest pê kir û li serbestiya axaftina kurdan ji nivîsara wan wêrektor, serbesttir, xweştir û rewantir e. Ez dixwazim ruhê wê axaftinê derbasî çîroknûsiyê bibe. Nivîsara kurdî ya îro esirandî ye, bêhteng e, ne serbest e, di nav şayesandinan da fetisiye.

Wextê dibêjin zimanê wî folklorîk e, qeşa çî dikin? Qeşt ew e ku guh daye kal û pîran, guh daye kelepora xwe, guh daye zimanê xas. Bi min ew tiştêki muhîm e. Di çîroknûsiya bakurî da, meseleya herî mezin, meseleya zimani ye. Gelek caran mirov ji zimanê wan tiştêki fam nake. Çima? Ji ber ku ew ziman ji eslê xwe dûr e. Şaşîtiyek ji heye, di warê helbestê da jî ew heye, xwe li peyv û mijarên qerace digirin, dibêjin qey wextê bi gotîna qerace qala tiştên qerace bikin dê bi ser bikevin. Na, ne wisa ye ev. Qala mirîşka xwe jî bike, qala pisîka xwe jî, qala goga xwe jî bike, cesaret bike qala tira ku hevalê te rezîl kiriyê jî bike, di meseleya “mijarê” da mirov dibêje qey li bakurî kurd der-jîyan in, ev jî rê li ber serbestiya wan a nivîsê digire.

Di hemû karan da wisa ye, lê ez dixwazim ji bo çîroknûsiyê yê yekê bibêjim, lazim e, mirov karê xwe tim bidomîne, nesekine, hinek hene ez dibînim bi çîrokekê dest pê dikin û hema dixwazin xwe çengî romannûsiyê bikin. Min ditîye ew kes gelek caran ji bi ser neketine. Çima qey çîrok sivik e? Çima qey çîrok li wan nafesilê? Peyva çîrokekê di nav xelkê da piçekî sivik e, xelk carna dibêje, “Dev ji van çîrok mirokan berdîn!” Gelo dibe ku ji ber vêya be?

**- Di paraştina ziman û çanda neteweyê kurd de, xwedîderketina li folklorê hêmaneke sereke ye. Lê -li gorî dîtina min- di warê nivîsina nûjen de jî, eger tu tûrikê folklorê neavêjî ser milê xwe, tu**

**bi rê ve naçî. Ji bo te, di kurdîyê de, ta çî astê gerek e mirov folklor û nûjeniyê bigihîne hev, an jî yekê ji ya din re bike bîngêh?** Folklor himê esasi yê zimani ye. Hemû warên hunerî û zanistî mecbûr in bi awayekî bi folklorê ra hevaltiyê bikin. Kesê ku ji wê dermale nebe, xav e, rijî ye. Lê divê mirov di nav qalibên folklorî da nivîsa xwe nefetisîne. Bikare teql lê bixe, lê zêde bike, sîmorên wê derbas bike. Tu kes nikare, zimanekî nû biafirîne, her kes li ser koka xwe şin tê.

Lê eger pîrsa nûjeniyê bê kirin, divê em bibînin ku jiyana kurdan diguhere, berê wan bêhtir li bajarên, lê li bakurî jiyana bajarên jixweber çênebû, piştî şewata gundan hema di carekê da berê kurdan ket bajarên, jiyana bajarên li wan nefesilî û kurdî nebû zimanê bajarên. Peyvên me, gotîna me li gundan asê man, ber nexwarin, neketin warên din, loma ya folklorî li çiyê xwe ma.

**Lazim e mirov ji kozika xwe derkeve, dinyayê bibîne.**

**- Di kurdiya nivîskî de, di hevokaziye de qelsiyek heye. Gelo vaxxarîna ji mîrate û gencîneya zargotîna, dikare ji bo bipêşvebirina hevokaziye bibê navgîneke kêrhatî?** Pêşî divê em ji xwe bipirsîn, nivîsa roja me çima qels e? Kal û pîrên me, dê û bavên me, zimanê me ji me çêtir dizanin, lê qelem di destê me da ye. Kesên ku dinivîsin, xwendê ne, ev xwendin gelek caran bi zimanê serdestan çêbûye. Loma xameya me xam e. Danûstendina me ya bi mezinên me ra, a bi kelepora me ra, folklorê me ra dê qelma me xurttir bike. Wekî din rê û dirb nîn in. Ziman gerek bê xebitandin, ne di warekî da, di gelek wan da. Em nikarin qîma xwe bi mîrateya xwe bînin. Lazim e mirov ji kozika xwe derkeve, dinyayê bibîne. Mixabin kurd gelek caran pirtûkên edebiyata dinyayê ji zimanên serdestan xwe dixwînin, ev jî rê li ber ramîn, xeyalsazî û atmosfera zimani digire.

**“WEHŞÊ DI HUNDIRÊ MIN DE, 99 MORÎKÊN BELAVBÛYÎ, AUSLANDER BEG, ji gelek alîyan ve û bi taybetî ji aliyê zimani ve pirtûkên qels in.**

**- Di navbera çîroka Fu’ad Temoyî, derketina Hawarê û hin berhemên din de lihevnekirîna li ser destpêka wêjeya kurdî ya nûjen heye. Tu kîjan serdemê ji wêjeya nûjen re dikê destpêk û di roja îroyînê ev nûjeniyê xwe gihandiye kû derê?**

Pîrsên ku li destpêka tiştan digerin, xizmetê ji çira dikin? Ez ê

dev ji destpêkê berdim, li roja me binêrim. Bi min tiştê ku edebiyatê dike edebiyat rexne ye ku himên wê di edebiyata me da sişt in. Li dinyayê tecrûbeya yê yekê heye, xelkê gotina xwe kiriyê, em dikarin ji pirtûkên heylî sîd wergirin, bê rexne çî ye û çawa tê kirin. Bi qasî ku min ditîye tehemula gelek kurdan ji rexneyê ra tune ye, zora wan dihere wextê tîn rexnekirin. Loma rewşa edebiyata me ya nûjen ne baş e. Kom û komik derketine meydanê û ji hêla rexneyê ve berê edebiyatê dane pesn-edebiyatê. Ji serê sibê heta evarê pesnê hev didin –car jî hevdu reş dikin– nahêlin kes wan rexne bike, du gotînan bikî erîştê te dikin. Lê çî dibe bila bibe, gerek em rê bi rexneyê bixin. Di vê babetê da sîucê weşanxaneyan jî heye. Gelek caran pirtûkan kurdan, ên herî mezin jî tê da –yek didu tenê bi kurdî çap dikin pirtûkên xwe, bi qasî ku ez dizanim “Belkî” û “Wardoz” in– bi piranî jî pirtûkên “tirkî” xweyî dibin.

Di meseleya bîşaftînê da, rewşênber û nivîskarên me jî bédeng in. Piştî girtina sazî û dezgehên, ez dibînim hinek ji wan xwe li zimanê serdestan digirin, bi zimanê serdestan dinivîsin û xwe li ber çavên wan û kurdên bîşaftî şîrîn dikin. Ji bo bîşaftina li bakurî çima ji parçeyên din ên Kurdistanê qet deng dernakeve? Ev jî pîrsek muhîm e ji bo me. Eger ji bo çareseriyê tu bibêjî, gerek ji

Kurdên li bakurî ji aliyê zimani da xemsar in, sersar in, guh li rewşa zimani nakin. Dikarin pîr zû terka zimane xwe bikin. Ji bo hûn terka tiştêki, kesekî bikin lazim e pêşî ew tişt li ber çavên we bê reşkirin. Li Bakurê Kurdistanê qîmeta kurdî kêm e, kurdî hatiye reşkirin, loma kurd, kurdî –yanî xwe– terk dikin, dev ji xwe berdin. Ev mesele ne li ser bala xelkê ye. Sîyasetmedar jî jixwe ji tasa zimane wan avê vedixwin û tu politika û bernameyeka wan a li ser zimani tune ye. Divê em ji birnekin li Bakurê Kurdistanê 25-30 milyon kurd dijîn. Xwendin û nivîsina bi kurdî pîr kêm e, 25-30 milyon kurd hebin, xwendevanê pirtûkan nagihêjin 5-10 hezarî. Disa eger di vî warî da em behsa weşanxaneyan bikin, li Bakurê Kurdistanê weşanxaneyên kurdan, ên herî mezin jî tê da –yek didu tenê bi kurdî çap dikin pirtûkên xwe, bi qasî ku ez dizanim “Belkî” û “Wardoz” in– bi piranî jî pirtûkên “tirkî” xweyî dibin.

Di meseleya bîşaftînê da, rewşênber û nivîskarên me jî bédeng in. Piştî girtina sazî û dezgehên, ez dibînim hinek ji wan xwe li zimanê serdestan digirin, bi zimanê serdestan dinivîsin û xwe li ber çavên wan û kurdên bîşaftî şîrîn dikin.

Ji bo bîşaftina li bakurî çima ji parçeyên din ên Kurdistanê qet deng dernakeve? Ev jî pîrsek muhîm e ji bo me. Eger ji bo çareseriyê tu bibêjî, gerek ji



propagandaya xwe ji her wisa. Bere bere ev belav bû û bû hûtekî heftserî. Sîyasetmedarên ku bi dewletê ra bi zimanê dewletê didan û distîndin wextê vegeyîyan hatin nav gelê xwe, wan terka zimane dewletê nekir. Sermiyanê sîyasetmedaran, zimane serdestan bû. Hin jî wisa ye.

**- Weşanên Wardozê hetanî aniha çî berhem weşandine û ji bo demên bê çî xebat û proje hene?**

Heta niha me 15 berhemên folklorî, yek li ser bîşaftînê û yek li ser rêzimanê 17 pirtûk weşandin. Bala me bêhtir li ser folklorê ye, lê di warên din da berhemên baş hebin em ê çap bikin. Em li ser kovara Hawar, Ronahî û Roja Nû-yê xebitîn, me folklorê wan derxist û bûn sê pirtûk. Em ê wan di demeka nêz da çap bikin, pirtûkên Celîlê Celîlî hene disa. Wekî din jî hevalên me berhevkarîyê dikin, hin pirtûkên da guh da xebata zimannasan a Weqfa Mezopotamyayê. Ez li mijara daçekan çûm, di mijara gi-hanekan da min hin tesnîf danîn. Di warê terminolojiyê da li gorî xebata zimannasan min termin guhertin.

**- Di çapa nû ya “Rêzimana Kurmancî” de, di kîjan beş û rêgezên de guhertin û nûkirina hene?**

Guhertin bêhtir ji aliyê raştîvîsê ve bû. Min di warê raştîvîsê da guh da xebata zimannasan a Weqfa Mezopotamyayê. Ez li mijara daçekan çûm, di mijara gi-hanekan da min hin tesnîf danîn. Di warê terminolojiyê da li gorî xebata zimannasan min termin guhertin.

**- Di mijara sivikkirina dengdêran de (ê, î, û) we şopa Mîr Celadet Bedirxan berda û we xwe li paraştina koka bêjeyê girt. Eger bi kurtaşî be jî, dixwazim tu angaş an jî nerîna xwe şîrove bikî.**

Bi qasî ku em dizanin, Celadet Elî Bedirxan li ser raştîvîsa kurmancî xebatek amade nekiriyê. Wextê em li Hawar û Ronahîyê dinîhêrin ev yek eyan e. Raştîvîsa yekgirtî a wan kovaran tune ye. Li gorî şertên wê demê ev normal e. Zimane devkî û nivîskî jî hinek alîyan ve ji hevdu diqetin. Mirov nikare zimane nivîskî bi temami li gorî zimane devkî lê bike. Di nav metnan da yan jî wextê hevokek serbixwe be, eger koka peyvê neyê parastin, ji bo tîgîhêştinê zehmetî çêdibe. Ev di zimane devkî da ne wisa ye.

**- Li gorî ku em dibihîzin, li bakurê welêt xebatîna hevbeş ji bo amadekirina berhemên**

**rêzimanî tîn kirin. Raştîya yê yekê çî ye û ev çî xebat in?**

Weqfa Mezopotamyayê li bakurê Kurdistanê ji bo zanîngeheka bikurdî çêbike hat avakirin. Ev sê çar sal in li ser terminolojiya rêziman û lingûstîkê, li ser raştîvîsê, li ser ferhenga varyantan, li ser ferhenga giştî, arşîv û folklorê dixebite. Ji her çar parçeyan û ji derveyî welatî gelek zimannas beşdarî vê xebatê dibin. Ev xebat, dê ji bo Rojavayê Kurdistanê jî pîr sîdewer be. Lazim e, xebatên ku her kesî eleqedar dikin, ne ji aliyê şexsan ve, ji aliyê komên pispor ve bîna çêkirin û temsîla hemû parçeyan, hemû pêkhatayan tê da hebe. Di vî karî da şewr gelekî muhîm e.

**- Nêzîkî 6 salan e ku zarokên kurdan li Rojavayê Kurdistanê bi kurdî tîn perwerdekirin û birêvebirina deverê bi xwe jî bi kurdî ye. Tu çawa li vî gavê dinîhêrî?**

Tecrûbeya bakurî ya perwedeyê heye. Lazim e, Rovaja guh li vî yekê bike. Herweha tecrûbeya dinyayê û gelên din jî heye. Serê ewil divê mirov bibêje, kurdan hîn gelek karên xwe yê zimani û rêzimanî çareser nekirine. Ev yek rê li ber yekîtiyê tîgîhêştinê digire. Lazim e sazîya zimane kurdî bê damezrandin û tê da kesên pispor kar bikin. Rê û rêgezên zimani bîna danîn, ji tecrûbeyên parçeyên din sîd bîna wergirtin. Bi qasî em dişopînin, di warê perwerdehiyê zimani da tevlihevî hene. Divê danûstendina me, şewra me ya bi hev ra xurt be. Karê perwerdeyê karekî zehmet e, kurd jî hêla şerî ve xurt in, lê ji hêla perwerdeyê ve qelsî û kêmanî gelek in.

**Gerek Rojava bi parçeyên din ra diyalogeka baş çêbike.**

**- Tu tevger û xebata wêjeyî -bi berhem û çalakîyên xwe ve- li Rojavayê Kurdistanê çawa dinirxîni?**

Xebatîna tîn kirin, lê bi min tîrê nakin, piştî ewqas tecrûbeyan lazim e, em profesyonel bin, sîd ji tecrûbeyên hevdu bigirin. Gelek Rojava bi parçeyên din ra diyalogeka baş çêbike. Kurdên çar parçeyan hevdu baş nas nakin, ji bo Başûr û Rojhilatî pîrsgirêka alfabe yê heye. Rojava û Bakur di vî warî da dikarin bêhtir guh li hevdu bikin. Ji bo vî yekê divê ji aliyê raştîvîsê da lihevkerinek hebe. Bikaranîn alfabe ya latînî ji bo her du parçeyan jî îmkaneke baş e. Xeletî û şaşîyan ku li bakurî hatine kirin, divê li wir neyên kirin. Ez dizanim li wê derê îmkân hîn nuh çêdibin, şerek heye. Em çîpas bidin û bîstîna di warê perwerde, huner û edebiyatê da, em ê pêşî li hevdu vekin.

**- Careke din sipas dikim. Mala we ava.**

Rêzimana Kurmancî Bahoz Baran

Serpêhatî

Cotkarê Bêkêr



Dildarê Mîdî

Hatiye gotin ku cotkarekî bîkêr hebû, zeviya wî ya bi nîskan çandî, keroşk û çêlîkên xwe, di nav de bi cih bûbûn.

Dema palehiya nîskan hat û xelkê dest bi çinîna nîskên xwe kir. Cotkarê bîkêr jî tevî malbata xwe hat ber zeviya xwe, da ku ew ji nîskên xwe biçine, lê ewî kir û nekîr, laşê wî nekete kar û xîret nekîr ku ew tu karekî bike.

Di wê demê de çêlîkên keroşkê tîrsiyar û ji maka xwe re gotin: - Dayê ka em rabin birevin, baştir e ku xwediyê zeviye nîskên xwe biçine û wê demê me hemûyan bi deştan bigire.

Keroşkê got: - De ka lawo sebrê bîkşînin, heta sibe ka dê çî bibe...

Yê cotkar ji zarokên xwe re got:

- Em îro dereng hatin, tu kar nema dibe; em ê sibehî werin û deşt bi palehiya xwe bikin, em ê ji vî alî deşt pê bikin heta em di aliyê din ve derkevin.

Ew wê rojê veşeriyar mala xwe, bêyî ku tu karekî bikin.

Roja din, dîsa cotkarê bîkêr tevî zarokên xwe hat ber zeviye, dîsa tirs bi çêlîkên keroşkê ket, lê keroşkê careke din çêlîkên xwe aram kirin û ji wan xwest ku sebra xwe bîkşînin. Keroşkan dît ku dîsa cotkarê bîkêr û bêxîret, bêyî ku karekî bike, veşeriyar mala xwe.

Çend roj bi vî rengî derbas bûn, bê ku ew tu karî li zeviya xwe bike, yan jî baqek nîsk biçine. Rojan roj dizîn, pê re pê re nîsk jî tevî hişk û pûç bû.

Cotkarê bîkêr ji zarokên xwe re got: - Bi Xwedê em nema dikarin van nîskên hişk û pûç biçinin, hema ya baş ew e ku ez agirekî vêxim, vê zeviye bi tevayî bişewitînim û xwe jê xelas bikim û serê xwe rehet bikim.

Hema di cî de keroşk deng li çêlîkên xwe kir û got: - Vê carê raşt e... xuya ye Xwedê heşkere ji mîrik sitandiyê! De haydê rabin, em birevin û xwe xelas bikin.

Gotarên ku tîn weşandin, nerînen xudanên xwe ne.

Kîjan Şeweyê Axafînê ji bo Bernameyên Radyoyê Baş e?

Tevî ku ezmûna êzgehan li herêma me nû ye, lê dîsa ji gengeşe û pîrsa ku ji deştê pêş ve xwe dide pêş ew e, gelo di pêşkêşkirina bernameyên radyoyan de, zimanê standard an zimanê civakê bihête bikaranîn dê baş be? Mebest jî vê pîrsê jî ew e gelo kîjan şeweyê axafînê dê ji bo bernameyan baş be, da ku armanca wê bernameyê pêk were û bigihe dil û guhên guhdaran.

Dibe ku hinek bibêjin ev pîrs girêdayî zimanê erebî ye û durrî zimanê kurdî ye, ji ber di zimanê erebî de ciyawaziyeke mezin di navbera zimanê standard (Fusha)

û yê civakê de heye, nexasim ku gelek devok û zaravayên zimanê erebî hene; lê di kurdî de tenê hinek gotinên ku ji bo xelkê giran in dibin kêşe.

Ji bo ku mirov karibe bersiva vê pîrsê bide pêwîstî bi naskirina her çar sitûnên sereke yê weşana êzgehan û çawaniya bikaranîna wan heye.

Sitûnên sereke yê weşanê, weke me got çar in: gotin, deng, muzîk û bêdengî.

Pêwîst e yê bêjer û pêşkêşvan van her çar sitûnan baş binase û ji bo çawaniya bikaranîna wan baş were perwerdekirin, wê çaxê ew ê karibe bi hesanî, tiştê ku dix-

ze bigihe yê guhdar, bigihîne. Nasnekirin û bikaranîna şaş a van her çar sitûnan, helbet dê bernameyê tîk bibe û nehêle ku bigihe armanca xwe û sûde jê were girtin.

Di encamê de zimanê guncaw (zimanê standard an zimanê civakê) kîjan e?

Li gorî tiştê ku li jorê hat şirovekirin, em dikarin her du şeweyên axafînê (standard, civakî) bi kar binin. Lê pêşî pêwîst e em koma guhdarên ku bername ji bo wan tê pêşkêşkirin (guhdarên armanckirî) nas bikin, ji ber di roja îro de kêma bername hene ku ji hemû civakê û nîşên

wê re tîn pêşkêşkirin, lewra yek ji mercên her bernameyekê ew e ku koma guhdarên wê were deştînkirin.

Wekî nimûne, bernameyên bi kurdî yê koma guhdarên wê mîr û jinên temenmezî in, gerek e ziman û axaftina civakê bi kar binin.

Xala dawî û ya herî girîng ku bi yê bêjer ve girêdayî ye: Gelo pêşkêşvanekî 50 salî, dikare bernameyekê ji bo ciwanên 15-16 salî pêşkêş bike, dikare bi zimanê wan û nêzikî dilê wan biaxive?

Dibe ku karibe, lê divê kesayetî û rîhê wî nêzikî yê ciwanan be.



Dilşad Xalid

Di encamê de em dikarin bibêjin ku hilbijartina bernameyan girêdayî bikaranîna dirûst a her çar sitûnên weşanê ye, her wiha naskirina koma guhdarên armanckirî û deştînkirina bêjereki guncaw ji bernameyê re.

Berî Xwekuştinê

Cibran Xelîl Cibran

Wergerandin: Cihan Hesen

Di vê odeya bitenê û bêdeng de, duh jina ku dilê min jê hez kirî, rûniştî bû.

Li ser vê balgîfa gulgulî serê xwe yê xweşik danî bû, ji vê peyala cam (krîstal) gupek meya ku niquteyeke bêhna wê tevlihev bûbû, vexwar.

Ev tişt hemî duh bû, duh jî xewneke ku venagere.

Lê îro, jina ku dilê min jê hez kirî çû, çû zemîneke durr û vala û kavilekî hejar û sar ku jê re dibêjin "bajarê azadî û jîbîrbûyîne".

Hîna şûnên pêçiyên jina ku dilê min jê hez kirî li ser cama ney-nika min xuya dikin.

Bêhna nefeseya wê xwe ji kincên min veneqetandiyê, dengvedana dengê wê li qunckên mala min neçûye.

Lê heman jin e, jina ku dilê min jê hez kirî ku çû bar kir cihê Qusey ku jê re têtê gotin "Newala Hecir û Aramiyê" (Wadî Hecir û Silwan). Hîna şûnên pêçiyên wê û bêhna hilkehilka wê, rişk û bîranînen giyanê wê dê di vê odeyê de bimînin heta sibeha bê.

Wê demê ez ê pencereyên mala xwe vekim, da ku pêlên bayê bi herikîna xwe hemî tiştên ku wê cadûbaza xweşik li pey xwe hiştine, bimale.

Ciwano, sîmetên jina ku dilê min jê hez kirî, dişibihe (dirûvên) jinên ku dilê we jê

hez kirî dide.

Ew heyîneke biseyr e, xwedawendan ew ji aramiya kevokan, xuşîniya maran, berzbûna Tawûs, dirindetiya gur, xweşikbûna gula sipî, ji tîrsa şeva tarî, kulmek xewlî, ji odeyan û ji kefa deryayê afirandiyê.

Jina ku dilê min jê hez kirî, di dema zaroktiyê de min ew nas kir, wê demê ez li pey wê diketim û diçûm nav zeviyan û di kolanê de min bi rahîlê wê digirt.

Di rojên xortaniyê de min ew nas kir, min nîgaşa rûyê wê di rûyê pirtûkan de didît, di ewrên asîman de min li xêzikên bejn û bala wê dinêrî û awaza dengê wê bi xuşîniya çeman re guhdar

dikir.

Mîna di rojên mîraniya xwe de ew nas kir, pê re rûdînistim û min deşt bi nîqaşê dikir û pîrs jê dikirin, da ku nêrina wê guhdar bikim.

Nêzikî wê dibûm û hemî êşên di dilê xwe de pê re bi parve dikirin û hemî razên giyanê xwe jê re digotin.

Ev hemî tişt di par de bûn, par jî bû xewneke ku venagere, lê îro ew jin çû zemîneke durr û vala û kavilekî hejar î sar ku jê re dibêjin "bajarê azadî û jîbîrbûyîne".

Lê navê jina ku dilê min jê hez kirî: Jiyan e.

Jiyan jineke cadûbaz û xweşik e, dilê me dikewîne, giyanê me dixapîne, wijdanê me bi sozan



dagir dike. Ku xemsar dibe, bêhnfirehiyê (sebirê) di me de dikuje; ku pîr nêzik dibe jî, diltengiyê di me de hişyar dike.

Jiyan jinek e ku xwe bi rondikên evîndarên xwe dişo û bi xwîna kuştîyên xwe, xwe bêhn dike.

Jiyan jineke rojên sipî ku bi şevên tarî dagirtî li xwe dike.

Jiyan jineke bi dilê mirovên baş razî be û yê malxwê dixwaze.

Jiyan jineke orispî ye, lê çeleng e, yê ku orispiya wê dibinin ji çelengiya wê nefret dikin.

RÊZIMAN

Venerîneke Dîrokî Li Rewşa Zimanê Kurdî 7

Ev Şewezar Çawa Peyda Bûne?

Di rûpelên çuyî de me têkilî û girêdana çend zimanên dêrîn "Somerî, Avîstayî û Pehlewî" bi zimanê Kurdî re, di ber çavan re derbas kir û me hinek ji bandora wan zimanan jî li zimanê Kurdî berçav kir. Lê di wan rûpelan tevan de jî me negot ka rewşa zimanê Kurdî çî bû û çawa bû?! Gelo zimanekî yekbûyî bû, yan jî (wek nuha) pîrşewezar bû?!

Em tiştêki der barê zimanê Kurdî yê wan serdeman de nizanin, çî belge jî bo bersivdaneke raşt li nik me nîne. Dewleta Mad (Mîdya) jî tiştêki nivîskî li pey xwe nehiştiye...! Vêca eger em bibêjin, ew mîletên ku bi gelek navan, wek "Gotî (Kotî), Kasî (Kaşî), Kardoxî, Hûrî, Mîtanî û Mîdî" di nav çiyayên Zagrosê de (ji başûrê rojhilat ta bakûrê rojava) dijîyan, ew yan hin ji

wan pêşiyên Kurdan bin, jixwe zimanê Kurdî bi hemû şewezarên xwe ve wê ji pašmayê zimanên wan pêşiyar be. Ev şewezarên zimanê Kurdî (bi vî pîrbûnê) jî, dê li wê gorê bi şeweyekî asayî cihên xwe di zimanê Kurdî yê neteweyî de girtibin.

Lê eger em bibêjin, zimanê dewleta Mîdya (Mad) zimanekî yekbûyî bû (ev jî tekez nebûye) û zimanê Kurdî jî pašmayekî wî ye, hingê zimanê Kurdî jî dê yekbûyî be, lê bi demê re û di bin hel û mercên jiyanan wan serdeman de, ew ê bûbe hevqas şewezarên têvel (ciyawaz)! Di vî pêvajoyê de pîrsek raberî me radiweste:

Eger em bibêjin, Kurd di reseniya hebûna xwe de yek regez û yek netewe bûn, gerek zimanê wan jî zimanekî yekbûyî be. Vêca ev zimanê yekbûyî, çawa li ser wîqas şewezaran hatiye parvekirin?! Pîraniya dîroknas û lêkolêrên

zimanên kevin dibînin ku şewezarên zimanan (hemû zimanan) bi egera peydabûna hin hel û mercên siyasî, civakî û cografî, bi dirêjahiya demê re, pêk tîn û hêdî hêdî ji reseniya koka xwe durr dikevin û ji hev jî (çî pîr, çî hindik) durr û nêz dibin.

1- Hin caran di çarçoveya herêma zimanekî yekbûyî de hêzine civakî li ser bingeheke êlî (eşîrtî), olî yan rêolî (mezhebî) peyda dibin. Bi sedema hin tîveliyên di nav wan hêzan de tîkiliyên wan bi hev re kêma dibin û bi demê re ji hev durr dikevin. Zimanê her hêzekê jî wan jî, li gora wê rewşa tê de û di bin bandora hin zimanên dîtir de, şewazekî bilêvkirineke taybet werdigire û bi demê re durr reseniya koka xwe dikeve û dibe şewezarekî wî zimanê resen.

2- Ji roja roj de Kurdiştan qada şer û cengê ye, qada serhildan û tepeskerîne ye. Di pêvajoya van rûdan û bûyeran de gelek

caran Kurd di bin darê zorê de ji herêm û navçeyên xwe, ji welatê xwe hatine koçkirin û durrxiştin. Li wan welatên koçberiyê û bi dirêjahiya demê re zimanê wan koçberên penaberkirî, wirde wirde hatiye guherîn û ji reseniya xwe durr ketiye, bûye şewezarekî cuda, wek nimûne; Şah Ebbasê Sefewî (1571-1626ê Z) çend êl û hozên Kurdî, wek: "Zaferanlo, Kîwanlo û Emanlo" jî herêma Azerbêcana Rojava koçberî Xurasanê kirin. Li gel ku zimanê wan penaberan Kurmançiya bakûr bû jî, lê bi dirêjahiya demê re hinekî durrî wî şewezarê Kurmançî ketine. Çûnkî di bin bandora zimanên Farişî û Turkmenî de gelek gotinên Kurdî ku hatibûn jîbîrkirin û li şûna wan hin gotin jî wan zimanan bi kar dihatin (min bi xwe ev guherîn di şewezarê wan de pelandiyê). Di bin van mercên deştînkirî de devokeke nû



Deham Ebdulfetah

li şewezarê Kurmançiya jorîn zêde bibû.

3- Ji hêla cografî ve jî, pîraniya erdnîgariya Kurdiştanê zîncîrên çiyayên bilind û şaxvedanên lat û zînanan in, gelî û newalên kûr in. Rêwîti û rêbîwariya di nav wan asteng û asêgehan de zor çetin e. Ji ber van pîrşîrkên cografî girêdan û tîkiliyên di navbera niştîciyên wan deveran de, nemaze niştîciyên pêş û paş zîncîrên çiyayan, pîr kêma bûn, an jî dihatin birrîn. Li wê gorê, tîkiliyên zîman û şewezaran, ji kokên wan ên resen dihatin birrîn. Bi vî yekê, şewezarîna nû li zimanê me zêde dibûn.

1-Mihemed Emin Zekî : Dîroka Kurd û Kurdiştanê - Beyrût - (1985)-R. (12-13) محمد امين زكي - خلاصة تاريخ كرد و كردستان - بيروت 1985 ص 12,13

# Helbestine Bijartî... Tal Nitzán

## Ji : Li kîjan Welatî

Ez li qiraxa goleke avjenîyê rûniştîme, pêyên min di ava kûr de, çelpeçelpê dikan. kesek min tê werdike. dibe ku ewî min têwernekiriba, ger bizanîba, ku ez avjenîyê nizamim, di rêya binavbûnê de ez diramiyam. Ez ê binavbibim, ta tilîyên pêyên min bihungivin binêbinî û ez ê dîsa vegerim ber bi jor ve. Serê xwe di nav avê re derxim û zanim, ku aniha, gereke “ Hewar!” biqîjim, berîya ku ez dîsa binavbibim, lê min jibîrker, ez li kîjan welatî me û gereke bi kîjan zimanî mirov bihewarke.

## Nocturne / Şewewî

Çêjeke kurt, û şev dimîne dirêj, asê û bêber laş careke dîtir xwe hembêzdike û xwe di kaxezan de bergordike û xwe li xwe asê dike. Hembêzkerin xwe vedike û tarîbûn derbasî nava milan û bin çerm dibe tûre dibe û hişyar dibe ajelê deryayê û çengoyên xwe ji hev vedike, tu veşargeh nîne. Halan bi kolanê dikeve: Hewar, weke Peugeot a ji zû de xwegirtibe, di dawîyê de ben bête birrîn. Û kî radize, binavdibe, jibîrdike, ew ê nebîne, çawa çavên bi rondik vedimirin û Ajel Okyanos dadiqurtîne.

## Paşniveroj û Keçeke biçûk

Tu bi demine sorsincirî û rûyekî tirş ji poşmanîya hişiyarbûnê, şiyar bû.


Xemgîniyeke sê salî tirsaxa xemgîniyên, ku hê li benda te ne. Çi dikare li ber dilê te bide. Min bi destekî dinivîsand, bi yê din te haşt dikir. Tu di min de naramî - dibe di perçeyê şêranî de, dide di şêrekî de, dibe di şemendeferekê. Ez jî bi te naramim - di Rêbendan a sar û kelê, ya ku ew ê di navbera min û Ekranê de, xwe bicihbikiriba heger te xwe di vir de ranekiriba. Aniha naramî di te de, serî hildide, û di min de jî: Tu dibe kelem, ku helbesta li ser te binivîsim.

## Zarokê sêyemîn

Ez zarokê te yê nenas im. Ez reşeka di navbera her du zarokên te yên çavşîn, yên beramber paşxaneyay tarîtiya min diçirsin. Ez, tiştê ku te jibîrker, tiştê ji te betabû, ez, tiştê te êşand. Ez serçogdibim - di dema tu çavan digire û deştan bal bi diyarbûnê de dirêj dike - weke ku tu li benda lêdana, ku nayê. Min bi rêya Kakao a ku te li pey xwe, ji xişxişê TDES a pelên Zilofan hiştîye, xwedîbike. Bi şevê ez xwe di qorzîya textê ewan de quncikî dikim, li wir listikên biçûk hene weke Kelehên dij hemî nebaşîyan, girêdayî bi dem a awayên şevê ve, gava ku, bêyî tu ha jê hebî, pêl tilîya min dikir

û te xwe bi pêş de diçimand, bo mitêla wan bêhawe şahik bikî. Gava tu çavên xwe digire ( Yên ku mîna yên min kes!) ez xwe di bin qapaxên çavên te de heştdikim û dikime pistepişt: Dayê. Tu hewla bidûrxistina Kabûsê riwê min dikî ma tê bi ser şermê tevî vebî, ku tu hê bikêmanî navê min nizanî. Di Keleka teng de em didu ne “The wounded forms appear: The loss, the full extent” Leonard Cohen Di Keleka teng de em didu

çamûra Europa li pozê me ye Ez im ew zarok, li serê min kumê Keştivanekî û sê heştirên morîkî li ser dêma min ya glover cemidîne, bi berstukira min î vekirî ve. Ez im ew jin , ya di ser ew î re diheje, çavên min hiç bi tu peravî ve ne girêdayî ne. kirasê min ne ji hevrişim û ne ji hirîyê ye, reş-belekî ye, û kaxezên di palisqeyê min de nameyê bi diwateya sêrbazan in: Raştî di kêlikekê de, di ne tutiştî de diwerive. Ez im zarok, wisa tenê ez



ne dizanim ku: Tilîyên lingên min ji tirsaxa bûne kevir, av jî devçatir e. Ez im jin, di bin kumê min de, çiçek werimî ne mîna tebayên avî, dengê ku ji min re dibêje, bêguman, di bin çerçeva reş de: bizanibe, tê hêminîyê nebînî.



## Tal Nitzán

Helbestvan, weşangêr û wergêr e. Li bajarê Jaiffa ji dayik bûye û li Buenos Aires, Bogota û New Yorkê jiyaye. Derdora 80 pirtûkî ji zimanê Spanî wegerandîye zimanê Hebranî; ji wan 2 Antolojîyên Helbestê yên Amerîkaya Latîni, berhemên gelek helbestvanên navdar ên mîna: “Cervantes, Machado, García Lorca, Neruda, Paz, Borges, Vallejo, Pizarnik û Pavese” û pexşanên: “García Márquez, Vargas Llosa, Cortázar, Onetti, Delibes, Toni Morrison, Ian McEwan, Angela Carter” û yên gelek nivîskarên din wegerandine. Nitzán, ji giringtirîn helbestvanên Israîelê yên helbestvanîya nûjen e, ta niha 6 pirtûkên helbestan bi Hebranî weşandin e û ew ji bo pir zimanan hatine wergeradin. “ di derbarê pirsê te de” yekemîn pirtûka wê ya helbestan e, ku ji hêla wegêr Gundula Schiffer bo zimanê Elmanî hatîye wergerandin û ji hêla Verlagshaus Berlin ve hatîye weşandin. Ji berhemên wê:

- Domestica, 2002 (Am Oved Verlag)
- Gewohnter Abend, 2006;
- Café zur blauen Sonne, 2007 (mit Bildern von Mira Cedar, Even Choshen)
- Als erstes zu vergessen, 2009
- Dieselbe Wolke zweimal anschauen (Keshev Verlag), November 2012.
- Zur deine Frage (Verlagshaus Berlin), 2017

Desmal bi hêminî ji birinê dirêjkiyê, dêma te te têşine, tête jêkirin û guh jî têşe, hiştû badayîye, dîsa paresû bi serhevde hatine û û tevahiya gewdeyê te diqire. dîsa. - Ez ê xwe li ser kêleka din palbidim.

## Pêkane

- Em wisa bibêjin, tu li ser kêlekê yî, pir dirêj, nêzik rêbendan e û tu li ser heman kêlekê

- Em wisa bibêjin, kêleka te ya dîtir tune be.

Weger: Abdulkadir Musa

## Abdulkadir Musa

Helbestvan, wergêr û şewirmendê civakî ye. Li Amûdê dibistan kuta kiriye, li zanîngeha Helebê Beşa Ziman û Wêjeya Fransî xwendîye û li zanîngeha Alice Salomon Hochschule Berlin- Beşa Şewirmendîya Civakî û Perwedehîyê kuta kiriye. Xelata wêjeyî ya Senatoya çandî ya bajarê Berlinê ya 2018'an wergirtîye.

Kulturname

ZIMANÊ KURDÎ Û ZANIST 3




Zeynulabidin Zinar

Ji dewlemendiya peyvay zedetir, zimanê kurdî ji aliyê gotinên pêşyan, biwêj, meselok, leqemok, pêkenok, lawje, heyranok, lawik û bacî, sitran, çîrok û çîrvanokan ve jî pir dewlemend e.

Divê neyê jîbirkirin ku kurdan di van 3.000 salên bihurî de, yazdeh alfabejên cuda bi kar anîne. Yanî kurdan zimanê xwe bi yazdeh alfabejan nivîsiye. Ew alfabeyên ev bûne:
Alfabeya Bizmarî
Alfabeya Avestayê
Alfabeya Aramî
Alfabeya Pehlewî
Alfabeya Masî Soratî
Alfabeya Gêzem/Hurujul Sir
Alfabeya Suryanî
Alfabeya Grekî
Alfabeya Kirilî
Alfabeya Erebbî
Alfabeya Latînî
Zimanê kurdî, ji xeynî her sê zanîngehên li Başûrê Kurdistanê, îro di 13-14 zanîngehên dewletê pêşketî de jî tê xwendin.

Dadgeha Tirkiyê... Pirtûkên Ş. Qasimlo û Celîlê Celîl Qedexa Kirin



Dadgeheke Tirkiyê, li devera Çelê ya Bakurê Kurdistanê sê pirtûkên kurdî ku girêdayî dîroka kurdan û Kurdistanê ne, qedexa kirine. Pirtûkên ku hatin qedexekirin, ev in:

- "Kurd û Kurdistan" ya nivîskar Ş. Ebdirehman Qasimlo.
- "Serhildana Kurd a 1880 ya Şêx Ubêydulâhê Nehrî" ya doktor û profesor Celîlê Celîl.
- "Tevgera Neteweya Kurd" ya nivîskar Krîs Kuçera.

Kurdî Xweş e

Table with 4 columns: Rêwî, Revend, Penageh, Tevgir, Vebirî, Oqyanos, Nexşerê, Bergirî, Karname, Vebuhtin

Gotinên Pêşyan

- Darê zorê ji bihuştê hatiye.
- Heger deşt e, heger zozan e, ruhê pezê şivan e.
- Bi werîsê xelkê danekeve bîrê.
- Mirov çî bike bi xwe dike.
- Heger tu nezana î, bikire canî.
- Çerxa cihanê bi xwendinê digere.
- Bêkarî mirin e.
- Ne her tiştê ku biçirise zêr e.
- Sibe tê, xêr jî pê re tê.
- Dizê malekê kurmê darekê.

Xaçepirs

9x9 crossword puzzle grid

Sitûnî

- 1- Peyam, risale - Kul û xem.
2- Sihir.
3- Paytexta Polendayê - Têkila av û maşî.
4- Pêlgir, boriya ku ji bo birûskê li jora banan tê danîn - Ajalên ku di avê de dijîn.
5- Rojê hefteyê - Di dawiya du'ayan de tê gotin.
6- Ne hişk.
7- Cînavkeke yekjimar.
8- Zêrê ku jin dixin qirik û sitûyê xwe.
9- Hêminî, bêdengî - Sir, tiştê veşartî.

ASOYÎ

- 1- Cejna kurdan a neteweyî - Êm û xwarina dewaran.
2- Du tîpên wekhev.
3- Navê "Mêrdîn"ê di tirkî û erebbî de - Nêrê çêlekan.
4- Îstûre - Cînavkeke pirjimar.
5- Rengekî aleya kurdî - Rih, devokî.
6- Bayê gewr û reş e ku ji agir derdikeve - Bajarekî mezin e Bakurê Kurdistanê.
7- Kesê/a di komekê de, yek jî komê ye - Rengê rojê.
8- Hezkerin - Dijwateya "erê".
9- Dijwateya "pêşîn" - Nazik, heştîyar.

Serpêhatiyên Kurdan

Seydayê Tîrêj

Dibêjin şahê Serhedan "xurik" li eniya wî derket. Çi qasî dixurand, şewata wê nedîşikeşt. Gelek textor hatin ser, tu çare jê re neditin. Rojê textorekî yûnanî hate ser wî, lê nihêrî û got:
- Dermanê vê xurê: Xwîna teyrê baz e.
Şah pirsî:
- Ka em ê teyrê baz ji kû bînin?
Pîrekî heftesalî jî şah re got:
- Şahê min, her sal di bîst û yekê îlonê de -roja mihrecana kurdan-, teyrê baz bi her her du wezîrên xwe ve tê serê Sîpanê Xelatê û seyranê dike.
Şah rabû di bîstê îlonê de çadira xwe li qûntara Sîpanê Xelatê vegirt. Pezekî qelew serjê kir û jehr pê de reşand. Şah kesên bi xwe re birin jora Sîpan danîn, da ku teyrê baz ewî pezî bixwe û jehrdadayî bibe û bi vî awayî teyrê xwe bigirin.
Sibeha bîst û yekê îlonê, dîtîn ku baz û her du wezîrên xwe Ûqab û Şahîn hatin li serê Sîpan danîn. Dema ku baz ew goştê teze dît, êriş kirê ku bixwe, lê wezîrê wî Ûqab gotê:
- Ez ê herim bimûçînim, dibe

Rêberê Nebaş Tim Dide Ser Rêya Şaş



ku ev goşt jehirkirî be... bila bi mirina min be û ne bi ya şahê teyr û tilûran be.
Dema ku Ûqab hat û hêtek ji wî goştî xwar, nas kir ku goşt jehirkirî ye. Ûqab gote baz:
- Ez çûm... goşt jehirkirî ye, tu û Şahîn herin xwe xelas bikin.
Baz û Şahîn firiyên çûn. Hevalên şah hatin, dîtîn ku teyrê Ûqab goşt xwariye, ne baz. Sal wergeriya salê, dîsa wek berê hatin û laşekî jehirkirî li ser Sîpan danîn. Dîtîn ku teyrê baz û wezîrê mayî hatin. Dîsa teyrê baz êriş goşt kir ku bixwe, vê carê Şahîn gote baz:
- Ez ê bixwim.
Dema ku Şahîn jê xwar, ew jî ket û gote baz:
- Ez jî çûm... goşt jehirkirî ye.
Baz firiya. Dîsa hatin; dîtîn ku Şahîn e, ne baz e. Sala sêyan dîsa hatin û laşê jehirkirî li ser Sîpan danîn. Dîtîn ku baz û du wezîrên nuh (Serûrî û Turûrî) hatin. Dema baz êrişî laş kir, her duyan got:
- De bixwe, ev goşt layiqî te ye.
Dema teyrê baz xwar, ket. Serûrî û Turûrî reviyên. Dema ku hevalên şah hatin ser, dîtîn ku teyrê baz bi xwe ye. Jê pirsîn:
- Çima te her du salên din nexwar?
Baz got:
- Dema ku wezîrên min Ûqab û Şahîn bûn, nehiştin ez bixwim, xwe kirin gorî min; lê wextê ku Serûrî û Turûrî bûn wezîrên min, ev halê min e.
Her wekî Tîrêj gotiye:
Eger te divê dem û wextê te xweş bin
Xwe bik doşt û hevalê yê gihiştî
Mekev berpêlê wî bayê nezana
Rêke tewş e tê her bimînî kuştî.

Peyva Windayî Da ku tu peyva windayî bibînî, peyvên jêrîn xêz bike:

ŞAR - ŞEVÎN - DEST - DADGER - BARANDIN - ÇARMÊRKÎ - ZER - WERÎS - XWÊŞBÊJ - ARVAN - BENÎŞT - ŞERVAN - HEYRANOK - ÇARGOŞE - SAZ - HISIÇA - KUVÎ - BERBANG - KULTÛR - BÊRIVAN.

Peyva windayî ji 6 tîpan pêk tê, ew jî navê çiyayekî Kurdistanê ye.

12x12 grid of letters for word search

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

9x9 grid of letters for word search